Kurtenihêrînek li ser LASLP’ê

“Qanûna Rehetiya Civakî û Têkoşîna dijî Belengaziyê” (LASLP) dê ji 1ê Çileya 2025an bikeve qada cihanînê. Ev qanûn ji bo raberkirina piştevaniyekê li gorî entegrasyona civakî û profesyonel a kesên ku bi awayê demkî tûşî rewş û mewqiyên dijwar dibin, hatiye pesendkirin.

- Rehetiya Civakî beşeke mafên gel e û destragihîştina bow ê bi pêdiviyên cihanînê yên herî kêm pêkan e.
- Piştevaniya civakî yak u Hospice général raber dike li gorî nirxandineke giştalî ye ku darêştina plana guncan ji bo dabînkirina hewcetiyên taybet (mal û mesken, tenduristî, fêrkarî, şixulîn û hwd) pêkan kiriye.
- Piştevaniya civakî xort, malbat û zarokan digire bin sîvana xwe.

Entegrasyona Hêsan

Karmendên Hospice général’ê pişta te di rêya vegera bo serxwebûnê da digirin û van xizmetan raberî te dikin:

- Çalakiyên taybetî parastin û bihêzkirina pêwendiyên civakî;
- Nirxandina pisporî û rênimandina şixulînê;
- Kûrsên fêrkariyên yên demkurt û demdirêj;
- Fêrkirina kar a profesyonel ji bo îcadkirina zemîneyê bo bidestxistina pisporiyên nû.

Handêrên şixulînê

Behremendiya tam ji derfetên profesyonel gellekî giring e, ji berk u ev derfet zemîneya parastina gengaz a peydakirina kar û berfirehkirina şebekeyê ji bot e dabîn dike.
Dema ku tu, heta bi awayê nîvdemî, kar dikî, ti beşek ji destheqa te ji alîkariya darayî nayê kêmkirin û bi vî awayî derhata te ya mehane zêdetir dibe.

Yekemîn 300-Frankên k utu werdigirî ayîdî te bixwe dibe û 15% ji bermahiya destheqê jî ji bot e tê parastin.

Pereyên serhevdabûyî ji bo xurtkirina serbixwetiyê di ware rêveberiya bûdceyê da

Ev pereyên serhevdabûyî ku li gorî hewcetî û xwestekan bi rê ve dibî, her meh tên dayîn.

- **Pereyên Serhev ên Bingeh** hewcetiyên rojane yên te û malbatê (xwerek, kinc, telefon, elektrîk, çalakiyên bêhnvedanê, gerr û hwd), lêçûnên îdarî û çalakiyên têkildarî entegrasyona civakî û profesyonel digirin bin sîvana xwe.
- **Pereyên Serhev ên Zarok** ji bo dabînkirina lêçûnên taybet ên têkildarî hewcetiyên zarokan (piştevaniya perwerdeyê, çalakiyên bêhnvedanê, çalakiyên derveyî-planê û hwd) hatine berçavgirtin.

Lêçûnên din, weke kirê û lêçûnên dermanî, Hospice général li ser esasa lêçûnên te û bi berçavgirtina şert û mercên taybet raber dike.

Hêsankirina Cihanînê

Pereyên Serhevbûyî yên mehane ku divê bên dayîn bi giştî her 6 mehan carekê tê hesabkirin. Eger şert û mercên te biguherin, divê vê guherînê/van guherînan derdem ragihînî. Hospice général bi giştî belgeyên îdarî û darayî ji te daxwaz nake. Bi vî awayî, kesên di bin sîvana piştevaniyê da dikarin bala xwe bidin ser bernameya Entegrasyona Civakî û Profesyonel a xwe.

Ji bo bidestxistina zanyariyên zêdetir, sardana laslp.hospicegeneral.ch bike